

World Theatre Day, 27 March 2016

Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars 2016



Message: Anatoli Vassiliev, Russia

Message

Gelo!.. pêdviya me bi şanoyê heye?

Bi hezaran şarezayên ku ji şanoyê dilsar bûne û bi milyonan kesên ku di ber de westiyane vê pirsê ji xwe dikin.

Ji bo çi pêdviya me bi şanoyê heye?

Di wan salan de, gava ku dîmenên li ser deka şanoyê bi rewşa mirov û welatan re têne rûbirûkirin, ew bê sûd û bandor têne dîtin, û di wê demê de mera dibîne, ku babelatên rastîn di jiyana rojane de tîn lîstin.

Şano ji bo me çi ye?

Pêşengehên bi zêr xemlandî û belkonên holên şanoyê, daniştekên qedîfeyî, periyên textê şanoyê yên gemarî, dengên şanogeran ên baş durustkirî- û berevajî wê jî- hin tiştên ku belkî cudatiya wan bi şêweyekî zelal xuya dibe: Sandiqên reş ku bi herî û xwînê lekekirî, ligel komek ji govdeyên tazî û hov di hundirê wan de ye.

Ew kane çi ji me re bêje?

Her tiştî?

Şano kane her tiştî ji me re bêje.

Çawa Xweda li ezmên bi cih bûn, çawa girtî di şikeftên jibîrkirî di binê zemînê de jar ketin, çawa hest kane me payebilind bike, çawa hezkirin kane wêranê peyda bike, çawa pêdviya tu kesî bi hebûna mirovekî baş di vê cîhanê de nemaye, çawa xinizî destlatdar e û çawa mirov di tenêtiyê de dijîn, di dema ku zarok di kongehan de diçelmisin, çawa gerek e ew hemû vegerin çolistanê û çawa roj li dû rojê em neçar in ji

hezkiriyan dûrkevin- şano kane her tiştî bêje. Şano herdem hebû û wê ta dawiyê jî bimîne.

Di pêncî yan şêst salên çûne de, û niha jî ew zor pêwîst e. Ji ber ku eger te bala xwe bidî hemî hunerên gelêrî, tuyê yekser kani bî bibînî, ku tenê şano kane- gotinekê ji dêv bide dêv, nêrînekê ji çavekî bide çavekî, nîşanekê ji destekî ta destekî, û ji guvde bide guvdekî. Pêdviya wî bi tu navgîniyê di navbera mirovan de tuneye. Ew beşê herî ronîdar e ji ronahiyê, ew ne bi ser Bakur, ne Başûr, ne Rojhilat û ne Rojava de ye- na belê ew kaniya roniyê bi xwe ye, ji bo her çar koşeyên cîhanê ronî dide, ew yekser ji hêla her kesekî ve tîn dîtin, eger yar an neyar be jî. Pêdviya me bi şanoya ku herdem têvel be heye, daxwaza me bi şanoyekê ji cureyên pir û têvel heye.

Ez hîn bawer dikim, ku ji navbera hemû şêwe û pergalên

If you need a Word file instead of a PDF file of the message, please write to info@iti-worldwide.org.

Copyright © 2016 by Anatoli Vassiliev and ITI, France

World Theatre Day, 27 March 2016

Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars 2016



Message: Anatoli Vassiliev, Russia

şanoyê ku niha gengaz in, şeweyên wê yên kevin, wê mêlag bikin ku ew pir tîn xwastin. Gerek e şeweya hozane ya şanoyê bi renekî ne asayî nakokiya netewên pêşketî neke. Niha, çanda olî her diçe lawaztir dibe, ji ber wê, ewa ku bi ``zanişwerên çandeyî`` bi nav dibe, hêdî hêdî heyînin sade têvedide û şûnê digire, lê em bi hêvî ne ku rojekê em dîsa pêrgî wan werin.

Lê belê, niha ez kanim bi şeweke diyar bibînim, ku: Şano deriyê xwe bi renekî fereh vedike. Derbasbûna bêpere ji hemiyên û ji her kesekî re gerek e.

Bila amraz û kompiyoter tune bibin- tenê here şanoyê, hemî rêzikên hol pêşengehan tijî bike, gotinê bibihîse û li wêneya zindî temaşe bike! Ew şanoy e, li pêşiya te ye, jê xemsar mebe û derfeta beşdariya xwe ji dest mede- belkî ew derfeta herî giranbuha be, ku em di jiyana xwe ya lezok û bê mebest de bi hev re hevpar bin.

Pêdviya me bi hemî cureyên şanoyê heye.

Tenê şanoyek heye, bê guman ew ji hêla kesekî de ne tê xwastin- mebesta min şanoya lîstokên siyasî ye, şanoya siyasî ya ``nêçîra mişkan`` e, şanoya siyasiyan, şanoya siyasetên bêber e. Tiştê ku -bêguman- daxawza me pê tune ye, şanoya tirsê rojane ye- çî yekanî be û çî gelekî be, tiştê ku ji me re ne gerek e şanoya laşe û xwîna li kolan û meydana e, li paytext û parêzgehan, şanoya derewîn ji bo pevçûnên di navbera olan û komên nijadî de ye.

Translation into Kurdish by: Leylan ELÎ

If you need a Word file instead of a PDF file of the message, please write to info@iti-worldwide.org.

Copyright © 2016 by Anatoli Vassiliev and ITI, France

World Theatre Day, 27 March 2016
Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars
2016



Message: Anatoli Vassiliev, Russia

If you need a Word file instead of a PDF file of the message, please write to info@iti-worldwide.org.

Copyright © 2016 by Anatoli Vassiliev and ITI, France